Li hebûna te digerim

Îhsan Hesen

Ez li hebûna te digerim
dibime tîrojkên rojê
Ji germa aşopa hêviyan difirim
ber bi warê tu lê berze bûyî
Ewrên reş bi awiriyan dibirim
tu jî di çipkên baranan de
Henasa min vedixwî
Ez ji dûr li hilma te digerim
Dibim geşatiya stêran
Kirêtiya şevê maçî dikem
Li dor bejna te ya nazikî jê bûy
Navên zarokan rêz dikem
Ji nişkave, çûçik difirin
Dibînim tu ya ji rex min çûyî
Ez li xerîbiya te digerim
Dibim bahuza befirê

Semayê bi canê te ra dikem
Ji bo bihara dil jê zîz bûy
Xemla spî li bejna te dikem
Êdî were
Xwe diçavên mijgirtî da
neveşêre
Min bawere
Bêdengiya bi lêvên teve zerbûy
Li kîve li te bigerm
Ne bêje ez ji te dûr kevitim
Bi sedan çavên bi hîvî
Yên wesitiyayî jî
Di nav parikê di mêza
serxweşan de
Heta nuke jî
Xewnên kîfkûy dibin
Li wijdana hizirên bê perde
Disaxin di kifnî de diçerin
Her roj bi awazên
Perîşan û qeçax
Semfoniyên westiyayî lêdidin
Çaverê çi bikeyin
Heta nuke jî
Xûsara dêmê te di hizirên me
da
Tayeka vegire
Dest bi nemana min diket.